

**Rapora
Mafên
Zarokan
ên Zimanî**



Çavdêriya Mafên Zimanî û Çandî

Rapora Mafên Zarokan ên Zimanî

Savaş DEDE

Werger: Omer Fîdan

Amed, Cotmeh 2020

ÇAVDÊRIYA MAFÊN ZIMANÎ Û ÇANDÎ

Rapora Mafên Zarokan ên Zimanî

Amed, Cotmeh 2020

Nivîskar:
Savaş Dede

Edîtor:
Ulaş Güldiken

Werger:
Omer Fîdan

Mijanpaj:
Zafer Tüzün

Tora Ziman û Çanda Kurdî

Diclekent Mah. Selahattin Eyyubi Bul. Altın-4 Sitesi C Blok Altı No:53/E
Kayapınar - Diyarbakır

Web: www.torakurdi.org
E-mail: info@torakurdi.org
Tel: 0549 660 22 21



Ev weşan di çarçoveya Bernameya YE Etkiniz de, bi piştevaniya Yekîtiya Ewropayê pêk hatiye. Ji naveroka vê weşanê tenê Komeleya Berî Her Tîştî Zarok berpîrsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê temsîl nake.

Naverok

<i>Kurte</i>	5
<i>Destpêk</i>	7
Rêbaz	8
Pirsgirêkên Têkildarî Mafên Zarokan ên Zimanî	9
Kurdî di Çarçoveya Berpirsiyariyên Dewletê yên Erênî û Neyînî de	13
Pirsgirêkên Aktorên Civaka Sivîl	14
Pêşniyazên Çareseriyê yên ji bo Mafên Zarokan ên Zimanî	15
Pêşniyazên ji bo Reformên Siyasî	15
Pêşniyazên ji bo Aktorên Civaka Sivîl	16
<i>Encam</i>	17
<i>Çavkanî</i>	18

Kurte

Ev rapor bi armanca destnîşankirina wan pirsgirêkan hatiye amadekirin ku bi astengkirina mafê perwerdehiyê yê bi zimanê dayikê li ba zarokan çêbûne.

Wek teknîka berhevkirina daneyên raporê, koma fokûskirî hatiye bikaranîn. Hevdîtin li Amedê, 5 jê jin, 9 jê mêr, bi beşdariya 14 kesan hat pêkanîn. Hevdîtin li ser platforma Zoomê pêk hat û tevahiya beşdarên nûnerên civaka sîvîl bûn ku ji bo zarokan xebatan dimeşînin.

Di amadekirina beşa teorîk a raporê de Peymana Mafên Zarokan a Nete-veyên Yekbûyî hatiye esasgirtin.

Di encama xebata çavdêriyê de hat destnîşankirin ku bi astengkirina mafê perwerdehiyê yê bi zimanê dayikê dibe sedema van pirsgirêkan:

a. Dewlet daxwazên têkildarî zimanê dayikê terorîze dike û xwe ji berpirsiyariyên xwe yên di vê qadê de dide alî.

b. Ev helwesta dewletê barê saziyên civaka sîvîl (SCS) girantir dike.

c. Saziyên civaka sîvîl ji aliyekî ve hewl didin ku vê kêmasiyê, vê cudakariya ku dewlet dibe sedem ji holê rakin û ji aliyê din ve jî bi terorîzekirina dewletê ya xebatên xwe re mijûl dibin.

d. Nêzikatiya dewletê ya li perwerdehiya bi zimanê dayikê û astengkirina wê ya xebatên di vê qadê de dike ku bi zarokan re “pirsgirêka hînbûnê” û bi vê ve girêdayî hinek pirsgirêkên derûnî û civakî yên din derkevin holê.

e. Di serî de perwerdehiya zarokan, ji qada perwerdehiyê derxistina zimên dibe sedem ku ziman di qada giştî de lawaz bibe û di encama vê yekê de Kurdî vediguhere zimanekî “nav malê”.

f. Ev diyar dike ku di heman demê de prestîja zimên kêm bibe.

g. Destwerdana li hemberî mafê zimanî ji aliyekî ve bi rengê tunekirina bîrê pêk tê û li aliyê din jî derfeta ku ziman xwe li gor şert û mercên serdemê veguherîne ji holê radike.

Ji bo ku pirsgirêkên bingehîn ên têkildarî zimên ji holê rabin jî, beşdarên ji bo reformên siyasî û aktorên civaka sîvîl ev pêşniyaz kirin:

- a. Divê Kurdî wek zimanê fermî bê pejirandin, bi taybetî jî divê zimanê siyasetmedarên Kurd Kurdî be.
- b. Ji bo ku dersên wekî din jî bi Kurdî bên dayîn, divê têkoşîn bê kirin.
- c. Divê di nava aktorên civaka sivîl de koordînasyon bê pêkanîn.
- d. Divê di perwerdehiyê de amûrên teknolojîk zêdetir bên bikaranîn, bi taybetî jî bernameyên têlêfonên jîrek ên ku Kurdî hîn dikin bên zêdekirin.
- e. Di serî de muzîk, divê sûd ji çanda devkî bê wergirtin; ji bo ku ziman di qada civakî de bê bikaranîn, xebatên zêdetir bên meşandin.
- f. Divê çapemenî û saziyên weşanê bên xurtkirin, hevkarîya bi Zarok TV û saziyên wek wê re bê zêdekirin.

Destpêk¹

Di piraniya metnên hiqûqî de² “her mirovek ku nebûbe 18 salî” wek zarok tê pejirandin. Xala 2yem a Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî dibêje “*Dewletên alî; mafên ku di vê peymanê de cih digirin, li hemberî tu zaroka/ê ku di qada rayedariya wan de ye bêyî ku tu cudakarî ji aliyê (...) nijad, reng, zayend, ziman, siyasî an jî ramanên din, rewşa civakî, neteweyî û etnîkî, mulkiyet, astengdarî, hatina dinyayê û statûyên wekî din ve bê kirin, nas dikin û tehud dikin.*” Bi vî awayî nîşan dide ku peyva “zarok” ji têgeheke teknîkî wêdetir, têgeheke wisa ye ku hemû pêkhatayên wateyî yên şênber û razber di hundirine. Heman pênase ji bo ziman jî bê kirin dê di cih de be. Ziman ne amûreke teknîkî ye ku bi tenê ragihandinê pêk tîne, teşe yan jî têgehek e ku rengê jiyane yê ku em jê re dibêjin çand bi awayê herî diyar nîşan dide. Ji ber vê yekê “*ziman diyardeyêke civakî ye*”³ û yek ji rengên herî girîng ên nasnameyê ye.⁴

Yên ku bi awayekî şênber an jî fîzîkî şiyana domandinê didin nasnameyê nîfşên dahatûyê ne; ew tişt e ku ji aliyê razber ve jî şiyana domandinê dide çand û zimanê ku yek ji hêmanên wê yên herî girîng e. Bêyî ku rastî tu pêkûtiyan bê, ji aliyê zarok ve bikaranîna zimên û bi zimanê dayikê wergirtina perwerdehiyê ji bo nasnameya wî/wê xwediyê girîngiyêke jiyaniyê û bi heman awayî ji bo pêşketina wî/wê ya ramanî jî xwediyê girîngiyêke bivênevê ye.⁵ Ji ber vê yekê “*di mafê zarokan de rêgeza bingehîn, mafê mezinbûnê ye*”.⁶ Ji ber van sedeman hemûyan, zimanê dayikê têgeheke wisan e ku derfetê dide civakê û bi taybetî jî dide zarokên civakê da ku tevahiya cîhana xwe ya wateyî li gor aûraya jiyana xwe ava bikin.

1 Ji ber piştgiriyên wan ên hêja, spasîyên xwe pêşkêşî Dr Cema Çiçek, Cewahir Sadak Duzgun, Omer Fidan, Serwet Deniz û kesên ku beşdarî civina koma fokûskirî bûne dikim.

2 Wek mînak, Peymana derbarê Mafên Zarokan de, Zagona Cezayê ya Tirkan bi hejmara 5237an, biryara bi hejmara 44/25an a 20ê Sermaweza 1989an a Lijneya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî hatiye pejirandin û Tirkiyeyê jî di 14ê Rezbera 1990f de îmze kiriye.

3 Lévi-Strauss, Claude. 2012. *Yapısal Antropoloji*. Çeviren: Adnan Kahiloğulları. Ankara: İmge. r.91.

4 Izsák-Ndiaye, Rita. 2017. *Dilsel Azınlıkların Dil Hakları, Pratik Uygulama Rehberi*. Cenevre: Birleşmiş Milletler İnsan Hakları Yüksek Komiserliği. r. 7.

5 Izsák-Ndiaye, berhema navborî. r. 11

6 Tezcan, Durmuş, Mustafa Ruhan Erdem, Oğuz Sancaktar, ve Rifat Murat Önok. 2018. *İnsan Hakları El Kitabı*. Ankara: Seçkin. r. 699.

Di çarçoveya Projeya Çavdêriya Mafên Zimanî û Çandî de ya ku Komeleya Berî Her Tiştî Zarok bi hevkarîya Tora Ziman û Çanda Kurdî û piştgiriya EtkinîzABYê dimeşîne, biryar hatibû wergirtin ku şeş (6) raporên tematîk bên amadekirin. Ev rapor mijara “Mafên Zarokan ên Zimanî” ku yek ji van temayan e dinirxîne. Ji ber girîngiya zimanê dayikê, armanca vê raporê têkildarî Kurdî vekolan û nîqaşkirina mijara zimanê dayikê û zarokan e. Lewra Kurdî bi salan e hatiye/tê qedexekirin û îro jî tevî ku qedexeyeke hiqûqî ya bi vî rengî tune ye jî, li saziyên fermî qedexe ye û li ser saziyên sivil ên ku di qada zimên de dixebitin pêkutiyên polîtîk hene ango bi awayekî *zimmî* qedexe didome.

Wekî ku ji pênaseyên zarok û zimên jî tê famkirin, ji bo ku çandek an jî nasnameyek bikare hebûna xwe ya madî û manewî bidomîne, divê endamên wê, ziman û çanda xwe bijîn û pê perwerde bibin. Dema ku mirov li şîroveyên giştî yên navbera salên 2008 û 2011an ên ku derbarê Peymana Mafên Zarokan a Komîteya Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî binihêre,⁷ tê dîtin ku Komîte girîngiyeke taybet dide perwerdehiyê û tê gotin ku polîtîkayên dewletên alî yên li Peymanê yên li hemberî zarokên gelên xwecih *di qadên perwerdehî û tenduristiyê de* qedexeya cudakariyê ya ku di xala duyemîn a Peymanê de cih digire bînpê dikin. Tirkiyeya ku aliyekî Peymana Mafên Zarokan e, ji bo xalên 17, 29 û 30em ên peymanê dûreparêzî daniye û gotiye ku dê peymanê li gorî Peymana Lozanê ya ku di 1923yan de hatiye morkirin û Destûra Bingehîn a 1982yan şîrove bike. Ku mirov bi kurtasî bibêje, Tirkiyeyê, ji Peymanê cudatir, pênaseya kêmaran ne li gorî “*nijad, ziman, ramanên siyasî yan jî wekî din, rewşa neteweyî, etnîk û civakî*” kiriye, diyar kiriye ku ew ê pênaseya kêmaran tenê li gorî pênaseya olî bike û nasnameya Kurdî jî ji ber vê yekê wek kêmar napejirîne. Tirkiye desntîşan dike ku dê rejîma yekzimanî ya di Destûra Bingehîn de bidome û bi vî awayî pêşî li perwerdehiya zarokên Kurd a bi zimanê dayikê girtiye. Dûreparêziya ku rasterast tê wateya bînpêkirina Xala 2yem a Peymanê,⁸ bi tenê wek astengekê namîne, vediguhere teknîkeke pişaftinê ya dewletê. Armanca vê raporê jî destnîşankirina pîrsgirêkên têkildarî astengkirina bi awayekî azad bikaranîna zimanê dayikê ya zarokên Kurd, pîrsgirêkên saziyên civaka sivil ku di vê qadê de dixebitin û pêşkêşkirina pêşniyazan e.

Rêbaz

Di xebatê de bi awayê ku Mayring⁹ pênase kiriye, ji bo ku bê famkirin, wa-

7 Birleşmiş Milletler Çocuk Hakları Komitesi'nin Çocuk Haklarına dair Sözleşme'ye ilişkin Genel Yorumları 2008 – 2011. Ankara: Uluslararası Çocuk Merkezi.

8 GİYAV. 2019. *İnternet Medyası Çocuk Hak İhlali İzleme Raporu*. Diyarbakır: GİYAV. r. 8.

9 Mayring, Philipp. 2011. *Nitel Sosyal Araştırmaya Giriş*. Çeviren Adnan Gümüş ve M. Sezaî Durgun. Ankara: Bilge Su. r. 82

tedarkirina sûbjektîf çawa girêdayî rewşa civakî dertê holê û ji bo ku nêrîn û helwestên kolektîf ên nûnerên saziyan bên famkirin, wek teknîka berhevkirina daneyan, teknîka koma fokûskirî hatiye bikaranîn. Ji ber ku di şert û mercên pandemiyê de hevdiîtina rû bi rû ne pêkan bû, hevdiîtin di platforma Zoomê de, bi beşdariya 14 kesên ji 8 saziyên cuda pêk hat. Ji beşdaran 5 jê jin, 9 jê mêr bûn. Hevdiîtin 150 deqîqeyan domiya. Di hevdiîtinê de mijarên wek zarok, mafên zimanî û girîngiya xebatên di vê qadê de, pirsgirêkên bingehîn ên aktorên civaka sivîl, binpêkirinên mafan ên ku di sala 2020an de di vê qadê de pêk hatine û pêşniyazên polîtîk ên hem ji bo mafên zimanî û hem jî rêveberiya dewletê û aktorên civaka sivîl hatin nîqaşkirin. Hevdiîtin bi destûra beşdaran hat tomarkirin û paşê ji bo raporê hat dahûrandin.

Pirsgirêkên Têkildarî Mafên Zarokan ên Zimanî

Her çî qas destpêka zaroktiyê (bûyîn an jî ketina hemla dayikê)¹⁰ ji aliyê teorîk û hiqûqî ve mijara nîqaşê be jî, ji bo zarokan serdema pêşîn a ku zimanê dayikê dibe mijara herî girîng ev e, serdema pêşdibistanê yan jî dibistana seretayî ya ku dest bi perwerdehî û hîndekariyê dikin.¹¹ Hem lêkolînên giştî¹² û hem jî lêkolînên ku bi taybetî li ser zarokên Kurdan¹³ hatine kirin, nîşan dane ku ji derveyî zimanê dayikê bi zimanekî din destpêkirina perwerdehiyê li ser zarokan bandoreke neyînî dike.¹⁴ Ku mirov li ber çavan bigire, perwerdehiya zarok di nava malbat, dibistan û xwendekaran de pêk tê, ji helwesta mamoste bigire, heta bi Tirkî zanîn an nezanîna malbatê rêzek pirsgirêkên pergali derdikevin holê û ev yek jî dike ku di temenekî biçûk de bi zarok re trawmaya “nekariya hînbûnê” çêbibe.¹⁵

Zarok, ji ber ku ji roja dest bi perwerdehiyê dike heta roja ku derbasî zanîngehê dibe ji bo zimanê “pergalê” tê radestkirin, ango piraniya saziyên perwerdehiyê ji ber ku di binê yekdestiya dewletê de ne yan jî bi destûra dewletê dikarin bixebitin, girîngiya veguherandina pergala dewletê zêdetir dibe. Wekî

10 Tezcan û yd. Berhema navborî. r. 90-93

11 Hinek beşdaran ku xebatên ji derveyî perwerdehiya “bi giranî nivîskî”, bi xebatên wek muzîkê re mijûl dibin dibêjin ku zarok di hemla diya xwe de jî di binê bandora hinek dangan de dimînin û ev yek ji bo gihîştina wan zarokan bandorker e.

12 Alidou’danakt. Ndiaye. Berhema navborî. r. 11.

13 Coşkun, Vahap, ve Nesrin Uçarlar M. Şerif Derince. 2010. *Dil Yarası, Türkiye’de Eğitimde Anadilinin Kullanılmaması Sorunu ve Kürt Öğrencilerin Dene-yimleri*. Diyarbakır: DİSA.

14 Dîsa Lijneya Giştî ya NY di sala 2001an de di şîroveya bi hejmara yekemîn a PDMZan de dibêje ku li gor Xala 29em dewletên ku vê peymanê destnîşan bikin divê bi perwerdehiyê bikin ku “*rêzdariya zarok a li hemberî dê û bav, nasnameya wan a çandî, ziman û nîrxên zimên, nîrxên neteweyî yên cihê ku zarok lê dijî yan jî bi eslê xwe ji wê derê ye û şaristaniyên cuda xurtir bibe.*”

15 Çağlayan, Handan. 2014. *Aynı Evde Aynı Diller / Kuşaklar Arası Dil Değişimi Eğitlimler, Sınırlar, Olanaklar: Diyarbakır Örneği*. Diyarbakır: DİSA. r. 98-103

ku li jorê jî hat diyarkirin, Tirkiyeyê mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê bi pê-naseya kêmarê ya di Peymana Lozanê de û bi Xala 42/9 a Destûra Bingehîn a 1982yan qedexe kiriye. Vê yekê kiriye ku zimanê Kurdî bêstatû bimîne. Beş-daran jî ev bêstatûbûn pêkutiyên ku li Kurdî tîn kirin di nava wan de wek kar-têkera ku herî zêde bandorker e pênase kirin.

Xala 30em a Peymana Mafên Zarokan kêmaran li gor babistîn, ol û ziman pênase dike û dibêje *“Çi zarokên kêmaran, çi jî zarokên gelên xwecih nikarin ji sûdwergirtina ji çanda xwe, ji bawerkirina bi ola xwe û ji bikaranîna zimanê xwe bêpar bên hiştin.”* Xala 29em jî mafê zarokan ê perwerdehiyê vedibêje. Li gor vê yekê, perwerdehiya ku zarok wergire, divê rêzdariya li hemberî ke-sayet, çanda xwe, ziman û nirxên xwe yên din, hawirdora xwezayî û nasna-meyên wekî din bike armanc. Li gor Xala 17em jî tê gotin ku dewletên ku aliyekî peymanê ne berpirsiyar in ku derfetê çêbikin da ku zarok bikarin sûdê ji hemû agahî û belgeyên neteweyî û navneteweyî wergirin ku ji bo pêşketina wan a civakî, derûnî, exlaqî û bedenî pêwîst in. Dîsa ew dewlet divê amade-kirin û belavkirina pirtûkên ji bo zarokan bi taybetî teşwîq bikin.

Rapora ku Izsák-Ndiaye pêşkêşî Konseya Mafên Mirovan a Neteweyên Yek-bûyî kiriye,¹⁶ wekî ku di wê de jî tê dîtîn, wexta ku kêmar bikarin zimanê xwe di perwerdeyê de bi kar binin, ev yek kalîteya perwerdehiyê zêdetir dike, dihêle ku komên kêmdertfet beşdarî jiyana civakî bibin, xwegihandina bi xizmetên giştî hê-santir dike û wek encama van hemûyan jî xetereya pevçûnên civakî kêma dike. Li aliyê din Jummins¹⁷ bi nirxandina 200 xebatên cerebeyî yên ku di 40 salên dawîn de hatine kirin, nîşan daye ku di navbera duzimanî û serkeftina xwendekaran a zimanî, ramanî û akademîk de têkiliyeke rasterast heye. Beşdaran jî li gor ezmûnên xwe yên xebatên saziyî gotin ku ji ber ferzkirina yekzimanîyê bi zaro-kan re pirsgirêkên hînbûnê dertên holê, pirsgirêka bixwebaweriyê diqewime, ne bi tenê li hemberî zimên, li hemberî diyardeyên wek muzîk û hunerê yên ku çanda wî/wê he dikin jî dibe biyanî. Lê bikaranîna mafê zimanê dayikê yê ku ali-yên wî yên aborî, civakî, derûnî û çandî jî hene, dewlet dispêre qada “hiqûqî”.

Wekî ku Fîdan jî aniye zimên,¹⁸ li Tirkiyeyê saziyên perwerdehiyê yên fermî bi tenê perwerdehiyê nadin, armanca wan perwerdehiyeke bîrdozî û polîtîk e. Armanca Zagona Yekkirina Perwerdehiyê (Tevhîdî Tedrisat Kanunu) ya ku di 3yê Adara 1924an de hatiye derxistin û hîna jî di binê ewlehiya Destûra

16 Izsák-Ndiaye, Berhema navborî. r. 11-17.

17 Jummins, Jim. 2013. «Dîsel Azînlîk Öğrencilerinin Eğitim Başarısının Altında Yatan Temel Psikodîsel ve Sosyolojik Esaslar.» *Çokdilli Eğitim Yoluyla Toplumsal Adalet içinde*, düzenleyen: Tove Skutnabb-Kangas, Robert Phillipson, Ajit K. Mohanty ve Minati Panda, çeviren Burcu Yalçınkaya. 59-79. Ankara: EĞİTİM-SEN.

18 Fidan, Omer. 2020. *Rewşa Ziman û Peverdehiya bi Kurdî li Tirkiyeyê*. Amed : Komelaye Berî Her Tiştî Zarok. S.1.

Bingehîn¹⁹ de ye gihandina “mirovê yekreng” e. Ev yek di sedema zagonê²⁰ de bi awayekî zelal hatiye diyarkirin. Ev rewşa ku wek yekzimanîkirinê tê binavkirin, “*Awayê hînbûnê yê zalimane yê ku zimanê zarokan, çanda wan, nasnameya wan û tevahiya rêzdariya wan a li hemberî xwe bênirx dike û hînkirina zimanekî biyanî li wan ferz dike.*”²¹

Li gor beşdaran pirsgirêka têkildarî ziman a herî girîng pêkutî û polîtîkayên dewletê ne. Bi polîtîkayên li hemberî zimên ne bi tenê zimên, cîhana wî ya wateyî ya ku he dike û tê de tê hekirin jî tê pişaftin, di hemû qadan de “zimanê desthilatdaran” dibe serdest. Ji ber ku xebatên hîndekarî û perwerdehiya zimanê dayikê her tim di binê siya pêkutî û siyasetê de tîne meşandin, ev yek dike ku perwerdehiya Kurdî jî qada giştî vekişe û perwerdehî bi nav malê sînorkirî bimîne. Bi vî awayî kodên zimên ên civakî û etnîkî û yên zarokan jî tîne qelskirin û pişaftin bi awayekî lezgîntir pêk tê.

Dema ku zimanekî di binê pêkûtiyan de bi diyardeya şikestibûna kesayetîya zarokan re bibe yek, astengkirina mafê zimanê dayikê ji aliyê derûnî û civakî ve dibe sedema trawmayên mezintir. Dîsa ev diyardeyên hesas û trawmatîk di rewşên qeyranî de yên wekî pandemî yan jî anomîk ên ku “herikîna jiyane ya asayî” xerab dikin, dikin ku hewldn ji bo ziman hindiktir encamê bidin. Bi gotineke din, dikin ku hemû derdorên civakî yên têkildar li hemberî qeyranên bi vî rengî zêdetir bkevin rewşeke hesas. Lewre piraniya beşdaran gotin ku meşandina xebatan di pêvajoya pandemiyê de zêdetir dijwar bûye.

Kurdiya ku li gor beşdaran bi pêkutî û astengkirineke bi pergala re rû bi rû ye vediguhere zimanekî “nav malê”. Bi vî awayî prestîja zimanê ku ji perwerdehiya teknîkî bêpar dimîne kêmtir dibe. Beşdaran bi mînakdayîna ji ezmûnên xwe gotin ku li cihên ku hiyerarşîya civakî heye ziman vediguhere Tirkî.

Ji derveyî van pirsgirêkan, bi taybetî ji ber ku statûyeke Kurdî tune ye û ji qada giştî hatiye dûrxistin, diyardeya “pêwîstnebûnê” derketiye holê. Ev yek jî dike ku pirsgirêka nebûna kesên pispor ên ku Kurdî baş bi kar tînin derkeve holê. Di piraniya wergirtina kar a sazîyên civaka sîvîl de jî Kurdî di asteke hindik de û di wergirtina kar de jî wekî sedema bingehîn a wergirtinê nîn e; wekî “sedema wergirtinê ya alîkar” dimîne.²² Ji ber vê yekê, xebatên têkildarî zimên rastî astengiyên aborî jî

19 Xala 174/1'an a Destûra Bingehîn a 1980'yi.

20 Can, Cahit. 2011. *Cumhuriyet Devrimi ve Öngörülemeyen Bugünü*. İstanbul :Kaynak. r.43.

21 Benson, Carol. 2013. «Çokdilli Bölgelerde En Etkili Eğitimin Tasarlanması: Çift dilli Modellerin Ötesine Geçmek.» *Çokdilli Eğitim Yoluyla Toplumsal Adalet* içinde, düzenleyen: Tove Skutnabb-Kangas, Robert Phillipson, Ajit K. Mohanty ve Minati Panda, çeviren Burcu Yaşınkaya, 114-140. Ankara: EĞİTİM-SEN.

22 Di vê rewşê de jî divê bê gotin ku dewlet berpirsiyariya pozîtîf a ku dikeve ser milê xwe bi cih nayne. Lewra li gor dane yên Wezareta Perwerdehiya Gel di sala 2020an de 19.910 mamoste hatine peywirdarkirin û ji vana bi tenê 1 ji bo mamostetiya “Zimanên û Zaravayên Zindî (Kurmancî/Zazakî)” hatiye peywirdarkirin. Çavkanî: Millî Eğitîm Bakanlığî. 2020. «Sözleşmeli Öğretmen Olarak Atama Yapılacak Alanlar İle Başvuruya Esas Olacak Taban Puan Ve Kontenjan Listesi.» *T.C. Millî Eğitîm Bakanlığî, Personel Genel Müdürlüğü*. 21.08. Hat dîtin: 10 28, 2020. <http://personel.meb.gov.tr/www/2020-haziran-sozlesmeli-ogretmen-atama-takvimi-ve-kontenjanlar/icerik/1029>.

tên û ev yek dike ku derfeta domandina polîtîkayên zimên ji holê rabe.

Di hevdîtînê de pirsgirêkeke din a têkildarî mafên zimanî yên zarokan derket holê jî, kêmbûna çavkaniyên perwerdehiyê û bi taybetî jî çavkaniyên teknolojîk²³ û li gor teknolojiyê veneguherandina çavkaniyên heyî bû. Li gor beşdarên, di roja me de ku teknolojiyê rengêkî diyarkertir wergirtiye derfeta têkildarî perwerdehiya Kurdî yên wek bernameyên kompîteran an jî bernameyên tîlefônên jîrekê pir hindik in. Ji bo bipêşxistina van derfetan nebûna çavkaniyên aborî pirsgirêkeke girîng e. Piştgirîdayîna dewletê bo perwerdehiya bi zimanê dayikê li aliyekî, di rewşekê de ku xebatên vê qadê bi awayekî domdar tî astengkirin û krîmînalîzekirin, wek çavkaniya fonan bi tenê sazîyên lêkolînê yên serbixwe û SCS dimînin. Lê piraniya beşdarên gotin ku ji bo piştgiriya projeyên lêkolînên derbarê Kurdî de di jwariyê zêde dikişînin.

Di hevdîtînê de pirsgirêkeke din a ku derket holê jî kêmbûna arşîvên xebatên li ser Kurdî bû. Di van pênc salên dawîn de, di serî de şaredarî, di êrîşên li dijî saziyan de arşîv û îstatîstîk bi zanebûn hatine tunekirin. Ji ber vê yekê, pirsgirêka herî girîng a têkildarî Kurdî tunekirina belge û agahîyan e ku “hebûna pirsgirêkan” datînin holê û belku jî ev belge û agahî di destê dewletê de ne. Bi gotîneke din, di vê rewşê de ku astengkirina pêkhatina bîrê yan jî tunekirina bîra heya heye, dane û agahiyên têkildarî rewşa sosyolîngûistîk a Kurdî di destê aktorên civaka sîvîl de pir hindik in.

Yek ji mijarên bingeîn ên ku ji aliyê beşdarên ve hatin nîqaşkirin jî windabûna zimên û zimanê(n) nava malbatê bû(n). Hinek beşdarên gotin ku bi tenê di nava malê de bikaranîna zimên dê pêşiyê li windabûna zimên negire. Piraniya beşdarên jî gotin ku zimanekî ku di nava malbatê de hîna hebe bi windabûnê re rû bi rû nîn e. Lê di nava malbatan de jî di mijara pedagojiyê de pirsgirêka agahiyên kêman jî çewt heye. Li gor beşdarên dê û bavên ku bi awayekî bi sazîyên wan re tîkilî danîne di nav wan de agahiyên çewt ên wek “mîrova/ê duzimanî tu zimanî baş bi kar nayne” hene. Ev agahiya çewt ji bo dûrxistina zarok a ji zimanê dayikê wek hincet û amûreke rewakirî tî bikaranînin.

Ku herî dawiyê mirov li neyîniyên²⁴ Covid-19ê ji destpêka sala 2020an ve li Tirkîyeyê derxistin holê binihêre, ne pêkan e ku mirov bibêje di van şert û mercan de pirsgirêkên tîkildarî perwerdehiya zimanê dayikê zêdetir kûr nebûne. Wekî ku li jorê jî hat gotin, dema ku mirov li ber çavan bigire ku perwerdehî di nava malbat, dibistan û xwendekaran de pêk tî, di şert û mercên

23 Hejmara pirtûkên zarokan ên ku di salekê de hatine weşandin bi tenê 82 ye.

24 EĞİTİM-SEN, 2020. *Pandemi Koşullarında Eğitim Araştırması*. Hat dîtin: 11 02, 2020. <https://egitimsen.org.tr/pandemi-kosullarinda-egitim-arastirmasi/>

pandemiyê de barê li ser milê malbatan zêdetir giran bûye. Nezanîna malbatê ya bi Tirkî yan jî zanîna hindik kalîteya perwerdehiyê kêmtir dibe.

Kurdî di Çarçoveya Berpirsiyariyên Dewletê yê Erênî û Neyînî de

Wekî encama tevahiya van dane û destnîşankirinan derket holê ku pirsgirêka herî girîng a têkildarî mafên zimanî yê zarokan nêzikatiya dewletê ya li mijarê û destwerdana wê ye. Ji ber vê yekê jî helwesta dewletê ya li hemberî Kurdî û mafên zimanê dayikê yê zarokên Kurd dê di çarçoveya berpirsiyariyên *erênî* û *neyînî* yê dewletê de bêt ravekirin. Berpirsiyariya *neyînî* wek berpirsiyariya destwernedena dewletê ya di mijara mafên mirovan de tê pênasekirin. Wateya wê ew e ku bikaranîna tevahiya mafên takekesî ji aliyê dewletê ve neyê astengkirin û di nava wan mafan de mafên çandî û mafên zimanî yê herî girîng in. Berpirsiyariya *erênî* jî ew e ku dewlet ji bo sûdeweriya hemwelatîyan û parastina mafên wan destwerdanê pêk bîne; ji vê hêlê ve wê yekê destnîşan dibe ku dewlet di serî de ji bo mafê perwerdeyê, her wiha ji bo ku civak bikare hebûna xwe biparêze derfetên xwe yê madî û razber bi kar bîne.²⁵

Dema ku mirov li rewşa Kurdî ya li Tirkîyeyê dinihêre jî, tê dîtîn ku rewşeke tam dijberî berpirsiyariyên ku li jorê hatin vegotin heye: Dewlet bikaranîna zimên asteng dibe (destwerdana *neyînî*), bikaranîna mafên ku dipejirîne (destwerdana *erênî*) jî dibe ku pêk neyê. Helwesta dewletê ya di vê mijarê de dikare bi vî awayî bê ravekirin:

a. *Polîtîzasyon*: Dikare wek terorîzekirin jî bê binavkirin. Ziman di serî de têgeheke têkildarî ragihandin û çandê ye. Lê dema ku Kurdî dibê mijara gotinê, dewlet tevahiya bûyer, diyarde û daxwazan her tim vediguherîne pirsgirêkeke polîtîk. Bi vî awayî helwesta xwe hem ji bo xîtabkirina li hestên girseyeke nijadeprest û neteweperest bi kar tîne û hem jî rewşên têkildarî Kurdî îlegalîze dibe û astengkirina mafan didomîne.²⁶

b. *Krîmînalîzasyon*: Hinekî ji xala li jorê ya ku di asta polîtîk de derket holê cudatir e. Helwesta di qada civakî û polîtîk de vedibêje. Di jiyana rojane de bikaranîna Kurdî dibê sedema hinek êrîşan.²⁷ Dewlet jî Kurdî polîtîze dibe û li

25 Shelton, Dinah, ve Ariel Gould. 2013. «Positive and Negative Obligations.» *The Oxford Handbook of International Human Rights Law* içinde, düzenleyen: Dinah Shelton, 1-12;12-12. Oxford: Oxford University Press. r. 1/12.

26 Mînaekeke ji bo rewşa ku çapemeniya ku beşdarî pêvajoyê bibe bûyeran çawa polîtîze dibe: Aydınlik Gazetesi. 2020. *Kışkırtmaya net cevap: Kürtçe tiyatro değil örgüt propagandası yasaklandı!* 15 10. aydinlik.com.tr/haber/kiskirtmaya-net-cevap-kurtce-tiyatro-degil-orgut-propagandası-yasaklandı-220729

27 Ji bo mînaekeke balkêş: Yeni Yaşam Gazetesi. 2018. *'Kürdüz' dediği için öldürüldü: 2006'da da kardeşleri öldürülmüş.* 23 12. Hat dîtîn: 10 28, 2020. <https://yeni-yasamgazetesi.com/kurduz-dedigi-icin-olduruldu-2006da-da-kardesleri-oldurulmus/>

hemberî êrîşên navborî polîtîkayên bêcezahiştinê dimeşîne ku li vir berpîrsiyariya wê ya meşandina lêpîrsîneke çalak jî heye, ziman di qada civakî de vediguherîne diyardeyeke krîmînal.

c. *Marjînalîzasyon*: Kurdî her tim ji bo qada polîtîk tê spartin û di qada civakî de jî wek diyardeyeke krîmînal tê dîtin û di dawiyê de dikeve rewşeke marjînal. Bikaranîna zimên bi piranî wek çalakiyeke marjînal tê dîtin. Wek encam; kesên ku zimanê wan ê dayikê Kurdî ye jî ditirsin ku bi Kurdî biaxivin.

d. *Bêprestîjîkirin*: Tevî wan madeyên ku li jor hatin gotin, dewlet Kurdî ji jiyana aborî veder dike, bikaranîna Kurdî ji pêdivîbûnê derdixe û wê dike tercîhek, hetta di hin rewşan de dike tercîheke polîtîk.

e. Ev yek jî dike ku ziman ji qada civakî, polîtîk û aborî bê vederkirin û hindiktir bê tercîhkirin, prestîja wî hindik bibe.

f. *Bêbîrîkirin û zimankujî*: Dema ku mirov li gor encamên li jorê jî binirxîne, mirov dikare bibêje ku polîtîkaya Tirkîyeyê ya têkildarî zimanê Kurdî bîra civakî tune dike û bi gotina Kangas vediguherîne zimankujiyê. Li gorî wî yek ji rêyên kuştinê jî, bêyî ku mirov bi awayekî fîzîkî bêne kuştin, zimankujî ye. Zimankujî, ew stratejî ye ku zimanê desthilatdar di her qadê de bê serdestkirin û zimanê kêmar û komên din ên kêmdarfet bê tunekirin.²⁸

Pirsgirêkên Aktorên Civaka Sivîl

Têkildarî rewşa ku hat vegotin, sazî û rêxistinên sivîl ên ku parastin û pêşxistina zimên kirine armanc jî tê de di tevahiya civakê de ev pirsgirêk dertên holê:

a. *Şiyana Domandinê*: Polîtîkayên zimên armancên sazî û rêxistinên ji derfetên domandinê bêpar dihêlin. Ev rewş jî rengê "bêstîqrar" dide xebatên di qadê de û bi awayekî xwezayî kes û saziyên ku di vê qadê de dixebitin bi pirsgirêkên aborî û mirovî re rû bi rû dimînin. Dîsa ji ber ku şiyana domandinê tune ye, di serî de arşîvkirin, pêkanîna bîrê pêkan nabe yan jî xebatên bi vî awayî qut dibin.

b. *Kêmbûna Hevkarî û Koordînasyonê*: Bi taybetî pirsgirêkên wek bi awayekî domdar polîtîzekerîna zimên ên ji derve ve û ji ber pêkûtiyan û pirsgirêkên navxweyî di navbera sazî, rêxistin û aktoran de hevkarî di asteke kêma de dimîne û aktorên ku di qadê de dixebitin di navbera wan de pirsgirêkeke koordînasyonê ya ku nikare bê paşguhkirin dertê holê.

c. *Biyaniyên û xwepişaftin*: Ev rewş dibe sedema *biyaniyên*²⁹ ku hesta

28 Tove, Skutnabb-Kangas. 2000. *Linguistic Genocide in Education—Or Worldwide Diversity and Human Rights?* London: Lawrence Erlbaum Associates. r. 312

29 Bi wê wateyê hatiye bikaranîn ku Seeman formulîze kiriye. Her çend her pênc hêmanan nehendirîne jî, wateya wê ya ku zexta sosyo-polîtîk vediguhere diyardeyeke sosyo-psîkolojîk û biyaniyê bi wê wateyê ji bo vê raporê têgeheke guncaw e. Seeman, Melvin. 1959. «On the Meaning of Alienation.» *American Sociological Review* 6 (24): 783-791.

biyanîbûna ji xwe, bêhêzî, bêwatetî, bêpîvanîyê di hundirîne û dibe sedema xwepişaftinê.

d. *Bêparbûna ji amûrên modern*: Li gel pirsgerêkên ku li jorê hatin vegotin, aktorên civaka sîvîl ji bo bikaranîna Kurdî, berbelavkirin û perwerdehiya wê ya ji bo zarokên di temenên cuda de ji navgînên wek bernameyên tîlefônên jîrek, lîstikên kompîterê, pirtûkên çîrok û perwerdehiyê yên xweser ên ji bo temen û komên cuda bêpar in.

e. *Barê Kar*: Beşdarî gotin ku ji ber ku ziman bi awayekî formal nayê hîn-kirin ango saziyên dewletê beşdarî perwerdehiya zimên nabin, barê li ser milê saziyên civaka sîvîl ên ku bi vê armancê dixebitin girantir dike.

Pêşniyazên Çareseriyê ji bo Mafên Zimanî yên Zarokan

Pêşniyazên ji bo reformên siyasî

Divê Kurdî wek zimanê fermî bê pejirandin: Li gor beşdarî ji bo sivikkirina pêkûtiya ku bi sedan salan e didome, amûra bingehîn perwerdehî ye û perwerdehî bi zanebûnê tê astengkirin. Ji bo ku hemû astengiyên têkildarî zimên ji holê bên rakirin, berî her tiştî divê Kurdî wek zimanê fermî bê pejirandin.

Divê cudakirina ziman û çandê neyê pejirandin: Li gor beşdarî, ji ber ku zimanê bajêr Tirkî ye, malbat jî ji bo ku zarokên xwe beşdarî jiyana bajêr bikin, Tirkî hîn wan dikin. Ji bo ku pêşî li vê yekê bê girtin, di çarçoveya polîtîkayê de divê Kurdî bibe zimanê hemû qadên jiyana civakî û pêşî li kûrbûna cudahiya di navbera ziman û çandê de bê girtin.

Divê piştgirîya hemû saziyên têkildar bê kirin: Yek ji pêşniyazan jî ew bû ku piştgirîya hemû saziyên heyî bê kirin. Li gor yek ji beşdarî weşana bi Kurdî ya TRTYê ne bi daxwaza dewletê, bi têkoşîna çapemenî û weşana Kurdî ya ku ji salên 90î heta niha didome pêk tê. Ji bo vê yekê, ji bo ku televîzyonên wek TRT Çocukê li gel Kurdî weşanên bi Kurdî û erebî jî bikin, divê pêkûtiya li ser saziyên dewletê bê zêdekirin.

Divê zimanê siyasî bi Kurdî be: Di nava siyasîmedaran de yên ku bikarin bi Kurdî biaxivin û bi Kurdî diaxivin hindik in. Divê hem zimanê siyasîmedaran û hem jî yê siyasî Kurdî be.

Polîtîkaya zimên: Divê ziman wek diyardeyê çandî û hunerî di çarçoveyê de berfirehtir de bê nixandî. Wek mînak; newayê muzîkê, çîrok, kevneşopiyê xweser a çanda Kurdî yan jî cil û bergê rasterast têkildarî forma razber a zimên in. Ji ber vê yekê, pêdivî bi polîtîkaya zimên a ku di nava hemû

saziyan de hevkarîyekê pêk bîne, di tevahiya van qadan de ziman biparêze û derxe pêş heye.

Dersên hilbijartî yên bi zimanê dayikê: Ne bi tenê ji bo hînkirina Kurdî, divê di qadên cuda de jî dersên bi Kurdî yên hilbijartî bên dayîn. Ev yek dê kalîteya perwerdehiya zarokên Kurd zêde bike. Beşdarên jî ji bo vê yekê pêşniyaz kirin. Lê mijara dersên hilbijartî jî dîsa bi sererastkirinên fermî hatiye sînordarkirin. Wekî ku Fîdan³⁰ jî gotiye, bi milyonan zarokên Kurd ên ku perwerdehiyê dibînin hene lê hejmara mamosteyên ku ji bo perwerdekariya Kurdî hatine peywardarkirin ji 30ê hindiktir e.³¹

Pêşniyazên ji bo aktorên civaka sivîl

Koordinasyon û hevkarî: Berî her tiştî divê di navbera SCSyên ku di vê qadê de dixebitin têkilî û koordînasyon bê xurtkirin. Di civîna Tora Ziman û Çanda Kurdî³² de jî Maseya Saziyan Zarokan pêşniyaz kir ku lijneya koordînasyonê bê avakirin.

Zêdekirina çavkaniyan û bikaranîna teknolojiyê: Beşdarên gotin ku pircureyîkirina çavkaniyan û hilberandina navgînên li ser bingeha teknolojiyê pêdivîyeke ferz e. Bi taybetî jî bi lezginî bipêşketina teknolojiyê eger li gor vê yekê xebat bê meşandin dê encamên baştir bên bidestxistin, eger ku li gor teknolojiyê li paş bê mayîn, dê rewşeke ku li gor serdemê jî pir paşvemaî be derkeve holê. Ji ber vê yekê jî, aktorên civaka sivîl divê di xebatên xwe de teqez kêmasiya çavkaniyan û faktora teknolojiyê li ber çavan bigirin. Dîsa di civîna damezirandina Tora Ziman û Çanda Kurdî de Maseya Nivîskaran pêşniyaz kiribû ku xebatên têkildarî wêjeya zarokan bên zêdekirin.

Girîngiya xebatên şiyarkirina civakê: Di mijarên wek yekzimanî, duzimanî û pîrziymanîyê de di qada giştî de agahiyên berbelav lê çewt an jî kêm hene. Divê li dijî van têkoşîneke çalak bê meşandin û derbarê sîdeweriya pîrziymanîyê ya ji bo pêşketina takekesî û ramanî ya zarok de raya giştî bi awayekî rast bê agahdarkirin. Di vê mijarê de divê xebatên şiyarkirina civakê bi awayekî taybet bên kirin. Dîsa di çarçoveya vê mijarê de divê lêkolînên xweser ên têkildarî Kurdî bên zêdekirin.

30 Fidan, Omer. 2020. *Wek Hêmeya Bingehîn a Çandê Zimanê Dayikê û Bikaranîna Wî*. Amed : Komelêya Berî Her Tiştî Zarok. r.11.

Izsák-Ndiaye, Rita. 2017. *Dîsêl Azînlîkları Dil Hakları, Pratik Uygulama Rehberi*. Cenevre: Birleşmiş Milletler İnsan Hakları Yüksek Komiserliği. r. 7.

31 Fidan, Dîsa li gel hemû astengiyên jî di serdema 2014-2015 a perwerdehiyê de 85.000 kesên serî li dîsa hilbijartî ya Kurdî ya ku Wezareta Perwerdehiya Gel ve kiriyê daye. Fidan, Omer. 2020. *Rewşa Ziman û Pêwerdehiya bi Kurdî li Tirkîyeyê*. Amed : Komelêya Berî Her Tiştî Zarok. r.5.

32 Heta ku li dijî wê tiştek neyê gotin, hemû nîşeyên derbarê civîna damezirînê de ji vê çavkaniyê hatine wergirtin: Fidan, Omer. 2020. *Wek Hêmeya Bingehîn a Çandê Zimanê Dayikê û Bikaranîna Wî*. Amed : Komelêya Berî Her Tiştî Zarok

Xurtkirina dezgehên çapemenî û weşanê: Di vê mijarê de beşdarên bi taybetî behsa girîngiya Zarok TVyê kirin. Dîsa di komxebata damezirandina Tora Ziman û Çanda Kurdî³³ de yek ji mijarên ku hemû mase tê de hev fikir bûn xurtkirina Zarok TVyê û zêdekirina weşanên bi mijara çand û dîroka Kurdî bû. Ji ber vê yekê divê aktor û sazîyên din ên civaka sîvîl piştgiriya xwe ya ji bo Zarok TVyê zêdetir bikin.

Di serî de muzîk balkişandina ser çanda devkî: Her çî qas ji ber pêkutiyên hejmara çavkaniyên çapkirî yê bi Kurdî asta ku tê xwestin di wê astê de nebe jî, kevneşopiyê Kurdan a çanda devkî ya dewlemend heye. Ji bo perwerdekirina zarokan divê ji vê çandê sûd bê wergirtin. Divê rastiya³⁴ kirpandinên xwezayî yê zimanê civakê rêtmên muzîka wê civakê nîşan didin û muzîk bi awayekî erênî bandorê li behremendiya hînbûnê ya zarokan dike, ev yek li ber çavan bê girtin û perwerdehiya muzîkê bê zêdekirin.

Encam

Li gel piştaftina rasterast a ku dewlet bi awayekî şênber ji sala 1924an ve heta niha li hemberî Kurdan disepîne, piştaftina nerasterast jî dike ku zimanê Kurdî bi tawanên re têkildar bê dîtin, di serî de qada aborî, têkiliyên wî yê bi sazîyên civakî re bîn qutkirin û bi vî awayî ziman prestîja xwe ji dest bide. Li gel van, ji bo bipêşketina zimên danemezirandina sazî û dezgehên giştî bi piştgiriya giştî yan jî sîvîl, destûrnedayîna damezirandina wan an jî pêkutiyên li hemberî yê heyî dike ku kesên pispor negihîjin.

Lê li gel hemû astengiyên jî, ji ber ku Kurdî hîna diyardeyê civakî ya pir xurt e û zimanê dayikê di heman demê de “pêdiviyek” e, xebatên têkildarî zimên di asta sazîyê de jî bi îsrar tînin domandin. Ziman ne qadeke wisa ye ku bi tenê bi polîtîkayan bê sererastkirin. Palpiştên wê yekê ya herî şênber jî zimanê Kurdî ye. Zimanê Kurdî yê ku bi sedan salan e di bin pêkutiyên siyasî de ye hîna jî diyardeyê xurt e ya ku dijî .

Ji bo ku ziman bigihîje rewşeke ku hêjayî wî ye, têkiliya zarokan a bi zimên re ku dê bike ziman bibe xwediyê şiyana xwedomandinê, divê li ser bingeha mafên mirovan bê rûniştandin. Madem ku astengiyên herî mezin a li pêşiya hişmendiya zimên a li ser bingeha mafên mirovan dewlet e, divê sazîyên civakê sîvîl li ser pergala dewletê zêdetir pêkutiyên bikin û ji bo ku wê yekê jî bi awayê herî baş bikin hem divê xwe ji nû ve biafirînin û hem jî koordînasyona xwe ya bi aktorên din re xurt bikin.

33 Fidan, Berhema navborî: r.22.

34 Yıldırım, Kemal. 1995. *Kodlîyê Yöntemi ile Müzik Eğitimi*. Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi. İzmir: Dokuz Eylül Üniversitesi.

Çavkanî

Aydınlık Gazetesi. 2020. *Kışkırtmaya net cevap: Kürtçe tiyatro değil örgüt propagandası yasaklandı!* 15 10. aydinlik.com.tr/haber/kiskirtmaya-net-cevap-kurtce-tiyatro-degil-orgut-propagandasi-yasaklandi-220729.

Birleşmiş Milletler Çocuk Hakları Komitesi'nin Çocuk Haklarına dair Sözleşme'ye ilişkin Genel Yorumları 2008 – 2011. Ankara: Uluslararası Çocuk Merkezi.

Coşkun, Vahap, ve Nesrin Uçarlar M. Şerif Derince. 2010. *Dil Yarası, Türkiye'de Eğitimde Anadilinin Kullanılmaması Sorunu ve Kürt Öğrencilerin Deneyimleri.* Diyarbakır: DİSA.

Çağlayan, Handan. 2014. *Aynı Evde Ayrı Diller / Kuşaklar Arası Dil Değişimi Eğilimler, Sınırlar, Olanaklar: Diyarbakır Örneği.* Diyarbakır: DİSA.

EĞİTİM-SEN, 2020. *Pandemi Koşullarında Eğitim Araştırması.* Hat dîtin: 11 02, 2020. <https://egitimsen.org.tr/pandemi-kosullarinda-egitim-arastirmasi/>.

Fîdan, Omer. 2020. *Rewşa Ziman û Pewerdehiya bi Kurdî li Tirkiyeyê.* Amed : Komelaye Berî Her Tîştî Zarok.

Fîdan, Omer. 2020. *Wek Hêmeya Bingehîn a Çandê Zimanê Dayikê û Bikaranîna Wî.* Amed : Komelaye Berî Her Tîştî Zarok.

GİYAV. 2019. *İnternet Medyası Çocuk Hak İhlali İzleme Raporu.* Diyarbakır: GİYAV.

Izsák-Ndiaye, Rita. 2017. *Dilsel Azınlıkların Dil Hakları, Pratik Uygulama Rehberi.* Cenevre: Birleşmiş Milletler İnsan Hakları Yüksek Komiserliği.

Jummins, Jim. 2013. «Dilsel Azınlık Öğrencilerinin Eğitim Başarısının Altında Yatan Temel Psikodilsel ve Sosyolojik Esaslar.» *Çokdilli Eğitim Yoluyla Toplumsal Adalet* içinde, düzenleyen: Tove Skutnabb-Kangas, Robert Phillipson, Ajit K. Mohanty ve Minati Panda, çeviren Burcu Yalçinkaya. 59-79. Ankara: EĞİTİM-SEN.

Lévi-Strauss, Claude. 2012. *Yapısal Antropoloji.* Çeviren Adnan Kahiloğulları. Ankara: İmge.

Mayring, Philipp. 2011. *Nitel Sosyal Araştırmaya Giriş.* Çeviren Adnan Gümüş ve M. Sezai Durgun. Ankara: Bilge Su.

Seeman, Melvin. 1959. «On the Meaning of Alienation.» *American Sociological Review* 6 (24): 783-791.

Shelton, Dinah, ve Ariel Gould. 2013. «Positive and Negative Obligations.» *The Oxford Handbook of International Human Rights Law* içinde, düzenleyen: Dinah Shelton, 1-12;12-12. Oxford: Oxford University Press.

Tezcan, Durmuş, Mustafa Ruhan Erdem, Oğuz Sancaktar, ve Rifat Murat Önok. 2018. *İnsan Hakları El Kitabı.* Ankara: Seçkin.

Tove, Skutnabb-Kangas. 2000. *Linguistic Genocide in Education—Or Worldwide Diversity and Human Rights?* London: Lawrence Erlbaum Associates.

Yeni Yaşam Gazetesi. 2018. *'Kürdüz' dediği için öldürüldü: 2006'da da kardeşleri öldürülmüş.* 23 12. Hat dîtin: 10 28, 2020. <https://yeniyaşamgazetesi.com/kurdüz-dedigi-icin-olduruldu-2006da-da-kardesleri-oldurulmus/>.

Yıldırım, Kemal. 1995. *Kodaly Yöntemi ile Müzik Eğitimi.* Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi. İzmir: Dokuz Eylül Üniversitesi.



Web: www.torakurdi.org
E-mail: info@torakurdi.org